Di bîranîna Seydayê Cigerxwîn de Şeveke toreyî li Qamişlo

Di bîrhatina 21-saliya koçkirina helbestvanê kurd ê navdar Cigerxwîn de, şeva 22-10-2005-an, kovara PIRSê şeveke toreyî li bajarê Qamişlo li dar xist. Birek ji rewşenbîrên kurd li şevê beşdar bûn, helbest û berhemên xwe pêşkêş kirin, û bi firehî li ser berhemên seyda û rewşa wêjeya kurd li Sûriyê bi tevayî axivîn.

Rezo, berhemeke dirêj li ser jiyan, helbest, çîrok û babetên dîtir ku seyda nivîsandine xistin bin ronahiyê û ji beşdaran re şirove kirin.

Konê Reş, helbestek bi navnîşana Cigerxwîn pêşkêşî şevê kir, û gotareke din jî li ser helbestvanê me yê gewre xwend.

Bavê Helbest, risteke xwe ya Kevin ku di sala 1984-an de, li ser koçkirina seydayê cigerxwîn nivîsandibû, pêşkêşî beşdaran kir.

Weşana Newroz, bi birûskekê tevlî şevê bûye, tê de li ser rola seydayê Cigerxwîn di geşkirina hestên netewî de axiviye.

Pişt re, beşdaran nêrîn û bîrbaweriyên xwe li ser rewşa wêjeya kurdî anîn zimên. Bi belavbûna mêvanan re, nûnerên komîta PIRSê digel hin rewşenbîrên kurd, gurzek gul danîn ser gora seydayê nemir, û bi navê komîtê gotinek bi zimanê kurdî di deftera seredanan de nivîsîn .

Li jêr, em birûska Newrozê ji xwendevanan re diweşînin:

Birûska WeşanaNwerozê

Xwişk û birayên hêja...

Tevî ko me bi derengî bihîst, wê Kovara PIRS-ê şeveke toreyî di bîranîna helbestvanê kurd ê gewre û navdar CIGERXWÎN de, li bajarê Qamişlo li dar xîne, em xwe neçar dibînin ko bi dilgermî û dilsozî piştgiriya vî karê we yê pîroz bikin, da ko em hemî bi hev re, gurzek gul û beybûn deynin ser gora vî mirovê hêja , yê ko di dema tarî û tengasiyê de, mîna çiyayê Bagokê, li kêleka doz û zimanê gelê xwe rawestiya ye, bi mêrxasî, berevanî di ber mafên gelê xwe yên dadmend û rewa de kiriye...

Bêgomane ko, rola helbestên seydayê Cigerxwîn di hişyarkirina hestên netewî yên kurdî de, roleke mezin bû. Bi hestên xwe yên nazik, bi gotinên xwe yên şêrîn, Cegerxwîn karîbû raman û bîrbaweriyên kurdayetiyê bigihîne her mirovekî kurd, û helbestên wî, ser rûpelên dilan hatin nivîsandin û ezberkirin. Cigerxwîn, ketiye her maleke kurd, û cihekî xwe yê bilind û bi rûmet, di toreya kurdî de girtiye.

Seydayê Cigerxwîn, ne tenê mirovekî helbestvan bû, lê belê ew bîrewer, aqilmend, zaniyar û siyasetmedar bû, wî dîroka gelê xwe û toreya wî ya Kevin hûr hûr xwedibû, ji ber wilo jî, ew ji kurdan re bûbû dibistan...!

Di baweriya me de, wefaya sereke ji seydayê nemir Cigerxwînn re ew e ko em evîna zimanê **D.R (5)**